


Çîroka Paskalya (Vejînê) ya Mesîhîyan



Wêne: Nina Garman, Pixabay

Gava ku Îsa mezin dibê, ew bi 12 şagirtan xwe re rêwîtiyê dike û ji her mirovê ku digihayê re behsa Xwedê dikir. Îsa mirovekê dilpak bû, û alîkarî dida hejar û nexweşan.

Gelek hevalên wî hebûn, lê belê hin dijmin jî. Hin rêberên Welêt hez nedikirin ku xelk ji wan bêhtir guh bidê Îsa. Ew ditirsiyan ku Îsa pir bi hêz bibe.

Yekşema Palmê

Yekşema berî paskalya Îsa û şagirtên wî biryar dan ku biçin Quds'ê (Orşelîm'ê) û li wir cejna paskalya yê pîroz bikin.

Wî ji du şagirtên xwe xwest ku ji bo wî kerekî peyda bikin. Îsa li kerê siwarbû û berê xwe da Qudsê. Li wir ew weke padîshahekî hat pêşwazî kirin. Gel diqîriyan: «Hosanna, Hosanna, padîşahê me hatîye!» Gel bi çiqilên palman, yên bi qasî ala, dihejandin. Hosanna tê wateya "her bijî".

Pêncşema Pîroz - civata mesîhî tê destnîşan kirin

Vê êvarê Îsa û şagirtên wî bi hev re xwarina cejna paskalya yê xwarin. Di wê demê de şûştina ligan, berî ketinê malê de, gelemperî bû. Wî çaxî xelk pêxwas an jî bi telikan dimeşîyan. Ji

ber wê lingên qirêj dibûn. Ji ber vê yekê li ber deriyê malê, Îsa lingên hemû şagirtên xwe şuştin. Wî ev yek weke nîşanekî kir, da ku her kes ji hev re bibê alîkar.

Gava ku wan xwarin dixwar, Îsa got: "Gelek dem a min nemaye ku ez dîl bêm girtin û kuştin." Wî her weha got ku ew dizanê yek ji şagirtên wî dê alîkarî ya leşkeran bike ku wî bigirin.

Cihûda, yek ji şagirtên Îsa bû, û bawer dikir ku Îsa rojekî bibe padîshahekê bi hêz û dewlemend. Lê çaxê wî dît ku ji Îsa re pere û hêz ne xem e, ew ji Îsa gelek aciz bû.

Piştî xwarinê bû derengê şevê. Îsa hemû şagirt bi xwere birin baxçeyekî. Li wir Îsa ji Xwedê re dua kir. Cihûda leşker birin baxçe û Îsa nîşanî wan da. Ji bo vê Cihûda 30 perê zîv stendin. Îsa dizanîbû ku Cihûda dê wisa bike, ji ber wê ew bi dilxwazî bi leşkeran re çû.



Wêne: Falco, Pixabay

Îna bi xêr - lêpîrsîn, darizandin, çarmixkirin û veşartin

Îsa fêhmîkir ku ew ê bimire. Xwedê ev yek ji zû de plan kiribû. Berî ku Îsa werê ser rûyê erdê wî dizanîbû ku ev qedera wî ye. Ew ji bo ku cezayê hemû mirovên gunehkar li xwe bigrê jidayikbû bû. Û niha dem hatibû. Leşkeran Îsa birin cem rêberên xwe. Wan bawer nedikir ku

Îsa kurê Xwedê ye. Wan digot: "Divê ew bimire, ji ber ku ew xwe wekî kurê Xwedê dibîne."
Wan Îsa li cihe ku jê re digotin Golgata çarmixkirin. Îsa li wir mir.

Nêzî 2000 sal berê, cezakirin a sûcdaran bi vî awayî gelemperî bû. Ew roj ji bo şagirtên Îsa û hemû hevalên wî rojeke reş bû. Lê wan nizanibû ku Xwedê ji bo wan surprîzek nuwaze amade kirîye. Şîna wan dê kurt ba.

Êvara Paskalya - cîhê veşartinê bi tundî tê parastin

Piştî mirina Îsa, hevalên wî ew xistin şikeftê. Yûsif şikeft dabû wan.

Yûsif dixwest ku Kurê Xwedê vê diyarî ya dawîn ji wî bistîne. Wan kevirek ê mezin gir kirin û dan ber devê şikeftê. Rêber du leşker şandin ku nobetê li gorê bigirin da ku kes neyê û laşê Îsa nedizê.

Yekşema Paskalya

Serê sibeha Yekşemê erdhejek çêbû. Melekek ji ezmên daket xwarê û kevirê ku li ber devê şikeftê sekinî bû, gerand. Gava nobedaran melek dît, ew ji tirsan lerizîn û reviyar.

Piştî demekî yek ji hevalên Îsa, Meryema Mejdela, hat. Gava wê dît ku kevir ji cih çûye, ew kete hundurê şikeftê. Di hundurê şikeftê de wê melekek dît. Melek ji wê re got, "Îsa ne li vir e, ew dijî! Here ji hemû hevalên wî re bêje ku ew ê wî dîsa bibînin!"

Meryem keyfxweş bû. Îsa ne miribû. Ew zindî bû! Wê şûnde bazda da ku mizginîyê bigihîne hevalan.

Duşema Paskalya

Di destpêkê de kesî ji şagirtên Îsa ji Meryema Mejdela bawer nedikir. Lê wê rastî digot!

Roja duyemîn a Paskalya ye, Îsa veşariya ku wan bibîne. Îsa bi rastî jî ji nav mirîyan rabûbû (vejîyabû)!

Roja hilkişînê

Piştî çil rojan, Îsa şagirtên xwe birin cihekê nêzîkê çiyayek ê mezin. Wî destê xwe rakir û ew pîroz kirin. Îsa got «Ji hemû mirovan re behsa min bikin». Piştî ew dîsa hilkişîya asîman.

Ji vê rojê re em dibêjin "Roja hilkişînê". Îsa di nav ewran de winda bû. Şagirtên wî matmayî mabûn û demek dirêj li asîmana nêrîn.

Ji nişka ve du melek di nav wan de xuya kirin. Melekan pirsî “Çima hûn hîn li virin û li ewran dinêrin?”. «Îsa ber bi asîmana ve hilkişîya. Ew ê rojekî di heman rê ya hûn lê hêliştine de, dîsa vegeê».

Dûvre şagirt bi dilxweşî vegeîyan bajêr. Îsa gelek tişt fêrî wan kiribûn. Tû car ji bîr nakin ku wî digot, “Hûn xema nexwun û netirsin. Bawerîya xwe bi Xwedê û bi min bînin. Li mala Xwedê cih gelek heye. Ez ê ji bo te cihekî amade bikim. Rojekî ez dê vegerim û te bi xwe re bibim dera ku ez lê jîyan dikim».